Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çileya Paşîn / 1 - 1 - 2021 | Kurdistan-Hejmar (188) | www.pdk-s.com

# Ew aliyê dixwaze danûstandinên Kurdî-Kurdî neçin serî sûdmend e

Kurdistan Siyamend Ebdulrezaq



Ev demeke danûstandinên di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî ENKS û Partiyên yekîtiya Niştîmanî PYNK bi serperiştiya Amerîka rawestiyane, wek ENKS dibêje ew rawestandin ji ber çend sedemên teknîkî ne û ji wan jî ne amadebûna aliyê Amerîkî. Lê hin kesayetiyên di nava PYNK didin xuyakirin ku ev danûstandin gihiştine rêyeke girtî, û hin alî jî di nava PYNK de vê yekê red dikin. Welatî jî li hêviya encamên baş yên van danûstandinan in. Ismaîl Eyûb wiha li ser vê mijarê dibêje, destêwerdana PKKê bûye sedem ku rê li ber danûstandinan were girtin, divê ev destêwerdan were rawestandin heta ku diyalog biser bikeve. Ala Omer jî wiha dibêje, Ew aliyê dixwaze danûstandinên Kurdî-Kurdî neçin serî sûdmend e, û dixwaze xêr û bêrên Kurdistana Sûriyê ji xwe re bibe û niha jî ew yek tê kirin, lewma divê sînorek ji vê destêwerdanê re were danîn, û êdî xelkê me ji kiryarên wan rizgar bibin.

# Berê bajarokê Eyn Îsa bi ku ve ye

Kurdistan-
Cîhan Osman

Berdewam grûpên çekdar û Hêzên Sûriya Demokrat li bajarokê Eyn Îsa şer dikin, û berdewam topbaran li ser vê deverên berdewam e, heta niha jî ti pêşketin li ser erdê nîne ji aliyê herdu aliyan ve, lê xelkê sivîl dibin qurbaniya şer û topbaranê.
Berî demekê Peyvdarê Hêzên Sûriya Demokrat Kîno Gabraîl ragehandibû pêwendiya wan li gel hêzên Rûsî yên li deverê berdewam in. Taybet li ser wê mijarê jî hem li ser mijar û binpêkirinên din ên li wê deverê çêdibin, gotûbêjên me li ser vê bingehê berdewam in. Ji bo ku rawestandina êrişên grûbên çekdar em jî li hêviya bersiva Rûsyayê ya eşkere ne. Da ku gavên pratîk bavêjin. Binpêkirinên grûbên çekdar ên ser Tirkiye ve rawestînin. Yên li ser bajarokê Eyn Îsa. Taybet vê hefteyê û meha borî de jî".
Ji aliyê xwe ve, Cîgirê Rêveberê Navenda Himêmîm a Rûsî ya Lihevanîna aliyên şerker ên Sûriyê ku ser bi Wezareta Berevaniyê ve ye di daxuyaniyekê de ragihand, bi armanca pêkanîna aramiyê li Eyn Îsayê, wan yekîneyên nû yên Polîsa Leşkerî ya Rûsî şandine wî bajarokî. Cîgirê Rêveberê Navenda Himêmîm Vyacheslav Sitnik diyar kir, rewş li Eyn Îsayê ne aram e û berî demekê wan ligel aliyê Tirkiyê li hev kirine ku xalên hevbeş ên Rûsî û Sûrî li wê deverê deynin. Artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve, êrîşên xwe li ser nahiya Eyn Îsayê zêde kirine û bi berdewamî firokeyên bêfirokvan li asmanê wê digerin. HSDê dibêje, ew ji aliyê xwe ve bersiva wan êrîşan dide û nahêle Tirkiye û çekdarên ser bi wê ve bi pêş ve bên. Rûsiya dixwaze bajarokê Eyn Îsa radestî rejîma Sûriyê bike daku ji jêr bandora HSD û Amerîka de derkeve û ew dixwaze desthilata rejîmê berfirehtir bike û xwe bighîne deverên ku petrol lê heye, lê Amerîka rijd e li ser radestnekirina deverên petrol ji bo Rûsiyê.
Mihemed Mehmûd wiha li ser vê mijarê dibêje, Rûsiya dixwaze Eyn Îsa mîna Efrînê bike û radestî Tikriyê bike heger HSD radestî rejîma esed neke, bi nerîna min Rûsiya HSD ditirsîne heta ku bajarok radest bike, lê divê rêkeftina di navbera aliyan de were eşkerekirin, gelo heta kîjan deverê grûpên çekdar dikarin derbas bibin ji ber ku HSD jî beşek ji van rêkeftinan e û ew hûrgiliyên wê jî dizane, bi rastî divê ev yek ji xelkê re were eşkere kirin û HSD ji xelkê re nehêniyan eşkere bike, û xwe ji ber rastiyê nede aliyekî.
Îsa Xidir wiha li ser vê mijarê dibêje, divê aliyên Kurdî bilez bighên rêkeftinekê da ku bi hev re biryarekê li ser vê mijarê bidin, yan jî divê dxawazê ji Amerîka bikin ku êrîşên Tikriyê li ser Eyn Îsa rawestîne.




# Nezanabûna ziman, mîratek reş e bi ser dagîrkeriyê ve


Mahir Hesen

her ku xweziyên mirovê kurd ber xwenan ve diçin , û li rastiya derdora wî valahiyek fireh diyar dibe , û nakokî ji ramanê wî cuda nabin , û di têkiliya de nehevsengiyek xuya dibe , û li peravên armancên xwe bêserûber dibe, Nebûna wî civakê de, her di temenên li pey hev de xerîbî dimîne taybetmendiya hevpar a hemî kesên ku ji ber êş dikişînin lê mirovê kurd ji rastiya xwe û cîhana rojhilata navîn vediqetîne.
Di Diyardeya biyanî taybetmendiyek xwe heye , ku tenê helbestvan, nivîskar û hunermendên afirîner dikişandin , lê em dikarin bêjin piştî kirîza buhara erebî veguheriye rewşek nîv-giştî ku bandorên wê her kes dikişîne û bitaybet kurd.
Hesta bêhêvîtiyê û hesta dilşikestinê di nav hemî civakê de belav dibe û buye, nemaze bi ava kirina deshilatdariya siyasî , ji encama pevçûna hatiye afirandin
Revenda kurd li Ewrûpayê, ne hevparin di xebatê de, lewma dûrxistin û marjînalkirina girêdana bi ziman û çandê ve tête pejirandin, buye sedem ku di nav nifşê nû de qeyranek nasnameyê derkeve . digel ku hejmarek ji wan li vî welatî çêbûne û hemwelatiya wî digirin û xwedan mafin , lê nayê wê wateyayê ku zimanê xwe piştguh bixin.
Çima revenda kurd bêxembare û rojana sarebûnek tûj li ba wa peyda dibe ?!
Pirsiv jî wisa ye , paşveçûn , nezanî, birçîbûn, nexweşî, şer, nexwendewerî, zordarî û tundî hemî bi Kurdan re hevwate ne. Başa em çima van hemî geşdanên nigetîv naguharin ?!
zimanê me ji hinekan re bû mijara şermê û çi kesê bi tevgerek e niştîmanî bilive û berpirsiyariya têkçûnê ya ku em jê dikişînin ji miletê xwe re derxîne, da ku ji nasnameya xweya rastîn dûr nebe , wî bi gotinên pûç û piçûk dikin.
kurd ji dîrokê wekî beşek ji pêkhatên nasnameyê nayê avêtin dema ku em li ser parastina maf bi dîrok û zimanê dayikê zanabin - bi dîtina min - hiş-girtina Kurdan û neçareserî li hember têgihiştina ziman û dîrok û çanda xwe , mîratek dine bi ser dagîrkeriyê ve .
Di dawiyê de, dîmenê revenda kurd ên li Ewrûpayê, lerzok, perçe xuya dike, bandorek bêpar e . roleke neyînî dilîzin , zirarek kûr û dûr digihîne ziman .
Gotina dawî ,
Ya ji bo me girîng ew e ku em beşek bingehîn di civaka Ewropî de a tê de dijîn, û beşdariya xwe fireh bikin û bandora xwe di karûbarên giştî de, bi karanîna çand û kulturê xwe bi zindîbûn û çalakiyê ve, ji tembeliyê dûr bixin . bi vî rengekî ku bi çanda welatê xwe li Ewropa bidin nasîn û zanîn .

# Guhertina riwê Efrînê berdewam e

**Kurdistan-**
**Hatim Mistefa**



**Grûpên çekdar di kiryarên xwe li Herêma Efrîna Kurdistana Sûriyê berdewam in,û her roj bi awayekî cuda dixwazin riwê bajar bugherînin, û ew dixwazin şûnewarên wê jî bi temamî jinav bibin, da ku riwê wê yê Kurdî nemîne.**
**Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê radigihîne, dewleta Tirkiyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve, li Efrîn destkariyê di kela Horî ya şûnwarî de dikin û rûyê wê yê dîrokî û nasnemaya wê ya kurdî diguherînin.**
**Rêxistina Mafên Mirovan li Efîrnê di raportekê de belav kir, "Dewleta Tirkiyê ya dagirker bi hinceta nûjenkirinê, rûyê dîrokî yê kela Horî û nasnameya wê ya kurdî diguherîne û wê dike mizgeft."**
**Diyar kir jî, "Dewleta Tirkiyê bi vî karî hewl dide nasnameya kurdîbûna Efrînê û demografiya wê biguhêrîne. Herwiha her tiştî li wê herêmê, bi çanda tirkî ve girê bide."**
**Rêxistina Mafên Mirovan destnîşan kir, li gor peymana Lahay a parastina milkên çandî di dema şeran de a di Gulana 1954an de hatiye danîn û di sala 1991an de hatiye sererastkirin, divê milkên çandî bêne parastin û neyin rûxandin û wêrankirin. Herwiha divê ji dizî û talanê jî bêne parastin.**
**Wê rêxistinê diyar kir, li şûna ku cihên şûnwarî yên Efrînê bêne parastin, artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ên di bin fermana wê de kar dikin, tawanên şer li hember milkên giştî û cihên şûnwarî yên Efrînê dikin.**
**Li vir hêjayî gotinê ye ku reporta Komîteya Lêkolînê ya Serbixwe ya derbarê Sûriyê de di raporta xwe ya 02.10.2020an de diyar kir, grûpên Artêşa Niştimanî ya Sûriyê (grûpên çekdar ên Tirkiye piştevaniya wan de) cihên olî û dîrokî yên gelekî girîng li Efrînê wêran kirine.**
**Kela Horî ku bi navê Yûnanî (Sîros) tê naskirin, li gor çîrokekê jî bi navê serkirdeyê Pêxember Dawûd Orya kurê Henan hatiye binavkirin. Kela li Herêma Efrînê li ber çemê Sabûnsê dikeve û dîroka wê vedigere hezar salî berî zayînê.**
**Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê di raporta xwe de bang li rêxistinên navdewletî, UNESCO, rêxistinên girîngiyê didin pirsên çandî, dîrokî û şaristanî destêwerdanê bikin û cihên dîrokî û şûnwarên Efrînê ji dagîrkeriya Tirkiyê û grûpên çekdar biparêzin.**
**Li gor raporên pêştir ên Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê, ji dema dagîrkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ve, zêdetir ji 40 cihên dîrokê, mezargehên olî û şûnwar hatine kolandin, dizîn û talankirin.**
**Li ser vê mijarê welatiyekî bajarê Efrînê wiha dibêje, ev kiryarên grûpên çekdarencam didin,bi mebest têne kirin û ew dixwazin demografiya bajarê Efrînê biguherin, û sîmayên herêmê nehêlin da ku di pêşerojê de bidin xuyakirin ku ev bajarne bajarekî Kurdî,lewma pêwîst e karekî cidî li ser asta navdewletî bê kirin da ku ev kiryar werin rawestandin, divê bi awayekî lezgîn dezgehên girêdayî şûnewaranli ser asta cîhanê bêne agahdar kirin ku şûnewar têne dizîn û hin ji wan jî ji bo mizgeftê têne guhertin, ev kar pilankirî ye û ji berya niha ve jî pilan ji bo wê hatiye danîn.**
**Henan Husam jî wiha li ser mijara şûnewaran ji rojnameya Kurdistan re dibêje, pirsa şûnewaran gelek welat têde beşdar in û ji wan jî Tikriyê û grûpên çekdar tenê guhê Deve dighên wan û bazirganên mezin sûdê jê dibînin.Nabe ev mijar wek kiryarên din werin piştguhkirin,lewma divê Kurd bi hemû hêza xwe dengê xwe bighînin aliyên peywendîdar,û ji wan re bidin xuyakirin ku şûnewarên me çawatêne dizîn û sîmayê bajarên me jî çawa têne guhertin li pêş çavê hemû cîhanê.Berî niha ev şûnewar ji aliyê rejîma Esed ve dihatin dizîn û niha jî ji aliyê grûpên çekdar ve têne talankirin û dizîn. Divê cîhan bi hewara Efrînê ve biçe û wê ji xwînmijan rizgar bike.**

## Şunewarên Efrînê biparêzin



## Dengê Efrînê bighînin cîhanê



## Kurd im





Mistefa Hemdî Elî

Welatê têde dijîm xelkîno
Me avakirî çar komar
Hatin çewsandin gava hildan
Xemal bejnaxwe li xwekirî
Û min bankirî
Bome reşkyê di çavê neyar
Û min rakirî
Gemara ser laşê û pora hinekirî
Mala xelkê avakirî û sipî kirî
Qelşa dîwarê cengêwan himêzkirî
Hewara min dinav desta
Gurê manco bi zaroktiya
Xwe ji bîr ne kirî
Laşêmin kirne çar par par
Ma ka mirovantiya cîhan temaşekirî
Nûka min naskir kîbû ev gur
Û kîjan lay dest dirêj kirî
Dilopê xwînê ji laşa hewar
Qêrîna sedê wek leyla
Bi dar vekirî
Divê tev rabin ji xwê
Çavê û porê sor gulî ber wî girî
Rêka serwera bişopînin dunya û herçar gur bihejînî
Gavê şehîda bi xwîna sor kirî
Gêncên kurda bêjimar bidar vekirî
Berya duhezar salin soma
Û kardox û mîtan bû tofan
Çend hezar hestiwê sera
Bibe qorban bo bibînî
Bi yekbin bela ronî be xakamin
Bihna azdiyê xweşe ne bimin tenê
Ne bona zêr û pera bo
Ala kurdista bête hildan
Û surûda reqîbê dil pola
Bête gotin ji her lêvan
Ji salên agirê dizikê meda
Min afirand
Ziman û war himjî gel min girêdan
Kurdim sera bilindikim ne erebim
Dirêka berzanî di mirim venagerim

# Hunermend Mihemed Elî Şakir, ked û xebateke bêhempa

## Çima termê wî bi ala Kurdistanê nehat pecan

Kurdistan-Heysem Xelef

Hunermend Mihemed Elî Şakir piştî xebateke bêhempa û zêdetirî 50 salan ji xizmeta hunera Kurdî kir û 300 stran ji gotin û awazên xwe ji hunera Kurdi re hişt û awaz ji 47 helbestan re danî. Hunermend Mihemed Elî Şakir, stranbêj û helbestvan, ku ji bajarê Serê Kaniyê ye û sala 1946an jidayîk bûye, bi korona koça dawî kir. 300 stran ji gotin û awazên xwe ji hunera kurdi re hişt û 47 helbest ji helbestên weku Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj û Bê Buhar, awaz ji wan re danîne. EW Sala 1946 li Dirbêsiyê ji dayik bû. Zimanê Îngilîzî li Zanîngeha Helebê xwend. 1968 çû Serê Kaniyê û bû mamoste. Mihemed Elî Şakir 1963 dest bi karê hunerî kir. 1968 wî û Mehmûd Ezîz yekem stran çêkirin. Nêzîkî 300 stran û helbestên wî hene. Gelek hunermendan stranên wî gotine wek; Mihemed Şêxo, Mehmûd Ezîz Şakir, Şehrîbana Kurdî û Gulîstan Perwer, Mistefa Xalid, Berdan Mardînê, Cemîla Mistefa û Zoya. ji stranên wî: Keçika Kurdî Me, Eyd û Erefat û Li Ber Dilê Min Pir Şêrîn e. Piştî ku Serê Kaniyê kete destê Tirkiyê, koçber bû û li Amûdê bi cî bû. Mihemed Elî Şakir, 24.12.2020 li Qamişlo koça dawî kir . Mihemed welatiyekî Serêkaniyê ye wiha li ser Hunermend Mihemed Elî Şakir dibêje, bi rastî ev kesayetî gelekî sade bû, û di hunera xwede gelekî zîrek bû, û xelkê deverên hemûyan jê hez dikir, û ti carî ti kesek jê aciz nebûye, lewma ew me dît di merasîma veşartina termê wî de ne hêjayî ked û xebata wî bû, divabû termê wî b ala Kurdistanê hatiba veşartin, wî bi sedan stran li ser Kurdistanê çê kirine, lewma ew hêjayî bû ku bi vê alê were pêçan, mixabin û sed carî mixabin merasîma cenazeya wî gelekî ne şêrîn bû, û ev cenaze ji kesekî wek wî re nayê kirin. Divabû aliyên peywendîdar li ser vê pirsê rawestiyabana û nehiştibana ku ev yek pêk were. Ez dikarim bêjim Mihemed Elî Şakir bi rûmet jiyana xwe jidestda û ti carî nebû peyê desthilatan, lewma ti guhdan bi mirina wî nehate kirin.
Cuma jî wiha dibêje, malbata Mihemed Elî Şakir cihê rêzê ne li cem xelkê deverê û kedeke wan ya zêde di pêşxistina hunera Kurdî de li Kurdistana Sûriyê, û her kes jî wan û hunera wan razî bû, bi sedan stranên neteweî gotine û di salên zor û zordariyê de, û ev yek cihê şanaziyê ye.
Ev jî yek ji helbestên wî yên navdar e:

<u>Eyd û Erefat</u>

Gava li me hat eyd û erefat
Roka sibê li me hilat
Ew dil û can ji ter kir xelat
Hew xeyrî van bi destê miv' hat
Dilê min bû behra bêbinî
Tu bû gemî lê sekinî
Te ez helandime ji binî
Evîna me bû serpêhatî
Kanî ew sozê te û min
Ka ehdê te li ber destê min
Tu bi kud' bir ew dilê min
Ew ehd û soz kêr min nehat
Gava tu li ber çavê min bû
Cîhan li ber min heyv û ro bû
Gava tu ji ber min dûr dibû
Bê te qet sebra min nehat
Ka hêlîna me ava kir
Xewnê şeva me esas lêkir
Bayê ber tavê xerakir
Ji serê min bir hiş û mat



# ENKS roja Ala Kurdistanê pîroz kir

Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS li hejmareke bajarên Kurdistana Sûriyê roja Ala Kurdistanê pîroz kir. Li bajarê Qamişlo merasîmek taybet ji aliyê ENKSê ve hat sazkirin bi boneya roja Ala Kurdistanê hejmarek xelk, endam û serkirdeyên ENKSê di wê merasîmê de beşdar bûn.
Ala Kurdistanê
Parlamentoya Kurdistanê sala 2009an biryar da, ku êdî her sal roja 17ê Kanûnê wek "Roja Ala Kurdistanê" were pîrozkirin.
Ji wê demê ve heta niha ne tenê li Başûrê Kurdistanê, lê belê li tevahiya Kurdistana mezin û li cîhanê ev roj ji aliyê Kurdan ve tê pîrozkirin.

Ala Kurdistanê:
- Komeleya Xoybûn ku Mîr Kamîran Bedirxan û Celadet Bedirxan û hinek şoreşgerên Şoreşa Agirî ava kirin, sala 1927 aleke Kurdî çêkirin, Îhsan Nûrî Paşa ew kir ala Araratê.
- Piştre jina Kurd Fatma Eseed Şahîn, sala 1945 li ser daxwaza Mistefa Barzanî nimûneyeke ala Kurdî çêkir, ew ala sala 1946 bû ala fermî ya Komara Kurdistanê li Mihabadê.
- Di wê alê de guhertinek hat çêkirin, tîşkên rojê bûne 21 û êdî bû ala ku em niha weke Ala Kurdistanê nas dikin.

